Australian Government

ParentsNext

Bikaranîna herîpirr a plana xwe ya beşdariyê

Şêwirmendê te yê ParentsNext'ê alîkariya te dike da ku Planeke Beşdariyê pêk bînî.

Ev plan alîkariya teb dike ku armancên xwe yên perwerdehî û karkirinê nas bikî û pêngavên din jibo amadekirina jibo karkriinê beriya destpêkirina perwerdehiya zarokê xwe yê biçûk rakî.

Ev plan pêkhatî ji babetên jêrê ye:

- Armancên perwerdehî û xebata te
- Çalakî, pêwîstiyên ragihandinê û nobetên hevdîtinê ku te ew pejirandine.

Çalakî lin gorî hewcetiyên te û malbata te tên eyarkirin. Ew renge pêkhatî ji babetên jêrê bin:

- Pêkanîna **Pisportiyên Amadetiya karî** weke nivîsîna CV'yê (Resûme), temrîna hevpeyivînê an wergirtina destûrê
- **Raboriya karî** an **Xebata xwebexş**
- **Kursên fêrkirinê, TAFE an zanîngeh**
- **Wergirtina piştgiriyê** jibo bidestxistina xizmetên xwecihî.

Heke tu di halê perwerdehî, karkirin an xebata xwebexş û dilxwazî da yî, ev babet wek hin çalakî di plana te da tên destnîşankirin – **pêwîst nake ku çalakiyên zêdebarî pêk bînî**.

Heke te jibo karên têkildarî çalakiya xwe hewcetî bi alîkariya aborî heye, ji raberkera xwe derbarê vêya ku gelo tu xwedan merc jibo wergirtina alîkariyê ji Sindoqa Beşdariyê (Participation Fund) yî an na, bipirse.

Tu plana xwe ya Beşdariyê kontrol dikî

- Dema ku digel ParentsNext'ê planeke nû amade dikî, 10 rojên karî derfeta te heye ku beriya wajokirina wê, derbarê wê bifikirî.
- Heke çalakiyek bi kêrî te nayê, digel şêwirmendê xwe derbarê guhertina wê biaxive.
- Ji kerema xwe di rewşa guherîna rewşa te û bandorkirina li ser şiyana te di şopandina armancên xwe da (wek mînak, heke wesayîta te ya veguhestinê tune, an tu hatiyî cîbecîkirin) mijarê ji Şêwirmendê xwe ra bibêje.

Jibo wergirtina lêzanînên zêdetir seredana vê adresê bike dese.gov.au/parentsnext